



10 sedemên dengdana ji bo Partîya Gelê

Partiya Gel a Xiristiyan - bi hev re ji bo rûmeta mirovahiyê

1. Bihayên herdemî

Partiya Gel a Xiristiyan dixwaze bihayên ku Norwec li ser hatiye avakirin biparêze, ji ber ku ev yek nikare bê piştguhavêtin. Eger em rehên xwe nas bikin, em di rûbirûbûnên xwe yên bi gel û çandên nû re bêhtir bi bawer dibin. Rûmeta mirovan, xêrxwazî û kardarîti ew biha ne yên ku siberoj li ser tê avakirin.

2. Dem û azadiya malbatan ji bo hibijartinê

Karvedana Partiya Gel a Xiristiyan ji bo malbatên ku zarokên wan ên biçûk hene, raste rast e: demeke bêtir û azadiya hibijartinê. Çareseriyên standardkirî yên kêmtir Divê malbat bîn xurtkirin - ne kontrolkirin. Partiya Gel a Xiristiyan dixwaze azadiya hibijartinê bide malbatan, ji bo ku her kes bikare çareseriyên ku li gorî wan û malbatên wan in hibijêre.

3. Civakeke temen dost

Divê li Norwecê mezinbûn rehet û ewle be. Partiya Gel a Xiristiyanan di wê baweriyê de ye ku dema wê yekê ye ku kesên bi kal û pîrên xwe re eleqedar in, bîn teqdîrkirin. Ji bo vê jî Partiya Gel a Xiristiyan ji bo dixwaze xwe piştgiriyeke ji kesûkarên wan re bê diyarkirin. Divê berfirehkirina cihên hemşîrekirinê dewam bike û xizmetên lînerîna li malan bîn xurtkirin.

4. Rûmeta mirovan di hemû qonaxên jiyânê de

Hemû mirov wekhev bi biha ne. Em ê di hemû qonaxên jiyânê de ji bo rûmeta mirovahiyê têbikoşin. Divê tu kes neyê veqetandin! Partiya Gel a Xiristiyan piştgiriyeke baştir dixwaze ji bo malbatên ku xwedî zaroyên xwedî pêdiviyên taybet in. Em bi tundî li dijî mirandina nexweşan û lawazkirina parastina qanûnî ya ji bo jiyana zaroyên ji dayik nebûyî ne. Her lîdanake dil hêjayî wê çendê ye em ji bo têbikoşin!

5. Pişesazî û afirandina kar

Îro gelek kes li derveyî jiyana kar in. Partiya Gel a Xiristiyanan wê bixebite daku xelkên zêdetir bîn tevlikerin. Ji bo gelek malbatan pandemik bûye sedemê bêkariyê. Divê em mirovan vegeerînin ser karê xwe.

6. Piştgiriya yên herî hewcedar dikin

Partiya Gel a Xiristiyan aliyê kesên herî zêde di nava civakê de bêtawîz in digire. Em ê ji bo çavdêrkirina bikarberên madeyên hişber, zaro û karkirina xurtan, piştgiriyeke bidin aliyên nehişkûmî û xwebexş. Ev girîng in ji bo pêşgirtin û alîkariya mirovên di rewşeke xetere de ne.

7. Veguhastinek baş ji baxçê zarokan bo dibistanê

Destpêkeke baş di dibistanê de bingeha gelek salên girîng di jiyana zarok de didane Partiya Gel a Xiristiyanan dixwaze li dibistan û baxçeyên zaroyan hejmareke mezintir a kesên xwedî berpirsariyê hebe. Em dixwazin sala yekemîn a dibistanê bê guhartin bo xwendina pêşdibistanê ku têde lîstik, ewlehî û têkilî roleke sereke bilîzin.

8. Civatên herêmî yên çalak

Partiya Gel a Xiristiyan dixwaze tevahiya welat bi kar bîne! Em çandiniyeke bihêz dixwazin ku bibe encama zêdebûna berhevanîna xwarinê, dahatek baştir ji bo cotkaran û parastina zeviyan çandiniyê bi awayeke baştir. Ev yek wê li tevahiya welêt kar peyda bike. Partiya Gel a Xiristiyan rêyên ewle û toreke rêhesinê ya bi pêş xistî dixwaze. Em dixwazin çareseriyên veguhastinê yên giştî baştir û berfirehtir derbasî tevahiya welêt bibin.

9. Siyaseteke tûnd û berpirsyar a avhewayê

Partiya Gel a Xiristiyan dixwaze erdê ji nîfşên siberojê re biparêze. Krîza avûhewayê beriya her yekê, ji bo belengazên cihanê dibe krîz. Mirov neçar in birevin û berpirsariyê me ya alîkariyê heye. Bi qutkirina berdana gazên ziyarbexş ên navxweyî û tevkariyeke aktîf a navneteweyî re divê em di rawestandina guhertina avûhewayê de pişikdar bin.

10. Xêrxwazî tu sînoran nas nake

Divê em ti carî zêde li xwe bawer nebin! Berpirsariyê me heye ku em alîkariya belengaz û bindestên cihanê bikin. Partiya Gelê Krîstyan dixwaze alîkarî û diravên pêşvebirinê di astek bilind de biparêze, ji ber ku em dibînin ku ew guhertinê çê dike!

